



# Helbijartinên Nîsanê Pêngavek Beref Gihorînê



**Dr. Nemtullah Hamd Nihêlî**



Li sîhê çwar helbijartinên civata nwînerên Îraqê û yên parêzgehên herêmê dêk dem da hatine encamdan. ev herdûk hilbijartine dû pêngavên giring bûn jibo doza Kurdî evça çi li ser astê navxxoyî bît, ko dibîte hokarê beref pêşçûn û çesipandina demukirasîyê li herêma Kurdistanê û dirustkirina hawkêşên nwî jibo birêvebirinê, çunkî dihête çaverêkirin belansa hêzê li herêmê li ser astê parêzgehan bihête gihorîn. anko dibît li parêzgeha Silêmanîyê îdare bikevîte didest bizava Goran da. evejî gihorîneka mezine û destaw destkirina deshelatê ye bi şêwekê aştîyane. û dencamda beref pêşçûna demukirasyetê ye li ser astê navxuîy. lê jilayê dîtir, layenên Kurdistanî li hember taqîkirineka dijwar û nûda ne li ser astê Îraqê, çunkî li çwar salên burî, pirusa sîyasî li Îraqê toşî qeyranên berdewam û metirsîdar bûyne. lîsta yasa ewa seruk wezîrên Îraqê (Nurî Malkî) serkêşîya wê diket, bizavkirîye layenên dîtir û hevpişkên xwe di hikûmetê da feramoş biket. jilayekîve bereyê Sunnî jêkvekirîye û bi tuhmeta tîrurê şîyaye hewên leşkerî yên berdewam li deverên Sunnî encam bidet. anko vîyaye ew devere dinearamîyeka sîyasî û leşkerî û êminahîy da bît, dako layenên sîyasî yên Sunnî bê hêz biket û derizên



mezin bêxîte dirêzên wan da. û ta radeyekê Malkî divê pîlana xwe da yê serkeftî bû. çunkî dçwar salên burî da bereyê Sunnî weko layenekê perawêzkirî û berbelav hatîye dîtin ko neşîyan li hember pîlanên Malkî û zlhêzî û diktaturîyeta wî bibine jimareka karîger. anko Malkî bi dirustkirina qeyranên berdewam bo Sunna, şîyaye hêzeka mezin û alîgirîyeka mezin bo xwe dinav mala Şîî da dirust biket. jilayekê dîtir, eger em li ewê hevrikîyê binêrîn ewa dinavbera layenên Kurdî û Malkî da hey, dê bînîn ko Malkî heman sîyaset li gel Kurdan jî bikarînaye (sîyaseta dirustkirina qeyranan). herçende Kurd pişkdarên hikûmeta Malkî bûyne, lê bi rêka dirustkirina arîşan bo Kurdan û cêbecê nekirina madê(140) û arîşên Pêşmergey û budcê û duseya neftê, Malkî weko layenekê hevdij û dujminkar li Kurdan temaşe kirîye. bizavkirîye çî arîşeka herêmê li gel Bexda dmawê çwar salên hkumiranîya wî da çare nebin, belko ew kêşe dijwartir û aluztir lê kirîne. evejî wê rastîyê diselmînît ko Malkî bi tak rewîya xwe, astengên mezin êxistîne hember piruseya aştbûneweyîya civakî û sîyasî û Kurd û Sunne û şî'e li berêk birîne û xwe weko swarçakekê nîşanî cadideya Şîî û layenê Erebên tundirew daye.



dencamda pirusa sîyasî li Îraqê ji kar keftîye û derizên mezin ketîne di Îraqa piştî azadîyê da. çunkî Malkî hemû dezgayekê birîyardanê û pustên êminahîyê êxistîne li jêr kuntirula xwe. û jiber nexoşîya Mam Celalî û lawazbûna pêgeyê deshelata seruk kumarî. gez û mqes ketine didest Malkî da û wî çawa vîyaye wesa pirusa sîyasî li Îraqê arastekirîye. bi vî rengî dişêyn bêjîn encamên evan helbijartinan dçarenivîssazin bo Kurdan jilayekîve û bo bizava demukirasîyê jî li Îraqê jilayê dîtirve. dişêyn hindexalan dîyarbikeyn ko encamên evan helbijartinan zur dikarîgerin û radê diçarenivîs saz bin li ser gelek astan weko:

### **1- peywendîya herêmê li gel navendê (Bexda):**

Senga Kurdan divan helbijartinan da dê siroştê ewê peywendîya aluz û ne guncayî ewa dinavbera herêmê û Bexda da hey êk laket. çunkî nuke ew peywendîye beref girjyê çûyne û her layenek gefa li yê dî diket û herduk jî yê li hîvîya encamên helbijartinan. çunkî hevpeymanîyên piştî ragehandina encamên helbijartinan dê semta wê peywendîyê arasteken. eger her Malkî weko seruk wezîr



hate hilbijartin û ew li ser heman sîyaseta xwe ya perawêzkirinê û qeyran çêkirinê ve çû, eve dê bîte eger ko jêkvebûn yan parçebûna Îraqê rwî bidet. jilayekîve Kurd ragehandina serbxoyê biken, û jilayê dîtir Sunne daxwaza herêmeka cuda yan jî dewleteka Sunnî biken. deshelata herêma Kurdistanê xwe li encamên evan helbijartinan digirît dako helwîstekê vebir li ser peywendîya xwe li gel Bexda dîyarbiket. lewra ev hilbijartine dçarenivîsî ne bo me Kurdan. jilayekîve (hindek alîyên Kurdî) hezdiken heman eqlîyeta Erebi ya takirew û diktaturî li Bexda dubare bibîteve, dako rê xoşkirinê biket bo wê cudabûna Kurdan û bihaneka mezin bît ko Kurd pêngava beref serxbobûnê bihavêjin. û jilayê dîtir heza şeqamê giştî li ser hêminkirina ewan arîşaye dinavbera navend û herêmê, çunkî cemawer yê ji qeyranan têrbûy û pitir hizirê dihebûna aramîyê da diket li şwîna hevrikîyê. lê hemû buçûn bo hindê diçin ko Malkî êdî li deshelatê bihête dûrêxistin, çunkî dûberekî ketîye dinav mala Şîî jî da û layenê (Sedirî û Hekîmî) li dijî kandîdikirina Malkî ne ko bo sêyemîn car pustê seruk wezêran wergirît. nexasime divan helbijartinan da dihête çaverêkirin ko kursîyên pêşbînîkirî yên (Hekîmî û Sedirî)



belansê bigihorin. û jilayê dîtir, Sunna jî dijatîkirina kandîdikirina Malkî ragehandîye ko careka dî ew deshelatê wernegirît. Eve jî palderên bihêzin hember dirustbûna hevpeymanîyên nwî di ayndey da dinavbera ewan herduk layenên Şîî (Sedir û Hekîm) li gel Sunneyên mîyanrew û layenên Kurdistanî, ko hevpeymanîyeka nwî li ser hindê hevtêgehiştinên saxlemtir û guncayî tir dinavbera wanda bihête pêkînan. ev hemû alîye jî dirijd û dihevrane li ser dûrêxistina Malkî. anko piştî encam dîyardibin, dê nexşeyê hevpeymanîyên nû yên sîyasî li Îraqê cudatir berçav bît. dencam da hawkêşên sîyasî li Îraqê û nexşeyê sîyasî jî dê hête gihorîn. herçende Malkî jî bi wî rengî berçav lawaz nabît ko bi sanahî bihête piştguhve havêtin. lewra dihête çaverêkirin ko pêkînana hikûmeta nwî li Bexda zur gîrubibît. û bigir û vekêşeka dijwar rwî bidet.

## **2- li ser astê navxxoyî:**

Encamên evan hilbijartinan dê divebir bin bo dîyarkirina senga layenên sîyasî li herêmê, nexasime ko herdû layenên serkeftî dihilbijartinên çûyî da (Partî û Goran) rêkeftinek li gel êk muhrkirîye bo pêkînana hikûmetê û layenên Îslamî jî



hatîne dinav kabîneya nwî li dwîv (asthqaqêt helbijartinan). jilayekîve Êketîya niştimanî dibînît ko ev rêkeftina dû qulî ya Partî û Goran li ser hisêba wê hatîye kirin û dê li şwîna rêkeftina stiratîjî ya Partî û êketîyê bît. vê yekê jî êketî tûrekirîye nexasime ko piştî bizava Goran çend pustekên giring dikabîneyîya heştê da wergirtîn, bûye şîrkê deshelatê û pişkdarekê karîgere dirêvebirina hikûmeta nûda. Eve jî metirsîye li ser pêgeyê êketîyê û zenga lawazkirina wê lêdidet. herçende divan helbijartinan da dengên êketîyê bilindbûyneve, lê ne bi wî astî ne ko rikmanîya Goran biket li Silêmanîyê. û ta nuke jilayê hêzê ve û li ser erdî Êketî yê deshelatê li Silêmanîyê diket, lê wesa dihête dîtî ko dê rêvebirin û deshelata Silêmanîyê kevîte didest Goran da. Di encam da eve dibîte eger ko Êketî ji bazinê deshelatê û rêvebirinê dûr bikevît û biçîte dibereyê opizsîunê da. çunkî heta nuke ew daxwazîyên Êketî li Partî diket jibo pişkdarbûna wê dikabîna heştê da Partî liber nehatîye û wan daxwazîyan mezintir dibînît ji qebarê Êketîyê. û eger Êketî pişkdarî hikumeta nû nebît, eve karekê metirsîdare nexasime ger bizanîn ew xudan hêzeka leşkerî ya mezine û jilayê abûrî jî ya bisenge. ev herdû wereqên didestê Êketîyê



da (zêdebarî wê çendê ko dengên êketîyê divan hilbijartinan da berizbûyne), eger Êketî van xalan bo êklakirina rwîdanan bikarbînît, dê metirsîya dirustbûna şerekê dî yê navxuyî peydabît. çunkî eve bîst û çend salekn ew xwe weko hêzeka karîger û xwedî birîyar li devera sewz û li herêmê bi giştî dibînît. perawêzkirina wê ya bizhmete û yarîkirine bi agirî. çunkî em hêj negehiştîne wî astî ko zwî bi zwî dan pêdanê bi şkestinê bikeyn û desta û destkirina aştiyaneya deshelatê bikeyn. bi vî şêuey pêdivye Partî bi hemî şêueyekî hevpeymanî xwe ya stîratîjî razî biket ko pişkdarîyê di hikumetê da biket, dako girê û metirsî nekevîne hember kabîneya nû û bişet xizmetê biket û bibîte kabîneka serkeftî nexasîme ko Partî serkirdatîya wê diket. şkestina wê şkestina Partîye û serkeftin jî bo Partî û hevpişkên wê ye. dîsan dirustbûna evê hev dengî û hev rêzîya layenên sîyasî yê Kurdî li ser pêkînanî hikûmeta nû dê senga Kurdan li hember Bexda bihêztir lê ket û dê navmalîya Kurdî rêk êxît. û dencamda fişarên navendî û herêmayetî jî li ser Kurdan dê di lawaztir bin, çunkî demê êk rêzî û hev gutarîya Kurdan hember pirsên çarenivîssaz hebît li gel Îraqê, dê layenên Îraqî jî pitir li ber wan daxwazîyên





Kurdan hên û dê fşarên nîv dewletî jî li ser layenê Kurdî kêmîtir û lawaztir dîyarbin. û rîkê nadene destên derekî ko bikevine dinavbera alîyên sîyasî yên Kurdî da û dê maytêkirina derekî li ser pîlan û karê herêmê xavtir bît, li wî demî dê pêngavên hejî û serkeftîyane beref asuyên geştir bo duza Kurdî û çesipandina mafên gelê Kurd li herêmê hêne havêtin.

### **3- li ser astê nîv dewletî û herêmayetî:**

hilbijartinên nû yên Îraqê û herêmê pêngaveka dîtire beref demukirasîbûnê û çesipandina hemerengîya sîyasî û azadîya ra derbirînê û serketina pêkve jîyanê. anko dibîte xaleka geş di mêjûya Îraqa piştî azadikirinê da. û li herêma Kurdistanê jî dibîte egerek ko civaka nîv dewletî bawerîyê bi pişkeftina demukirasîya herêmê bînît û piştevanên wê bin bo pêngavên mezintir jî. anko van helbijartinan sernca civakê nîv dewletî û vîyana wê bo herêmê rakêşaye û dê bîte eger ko bi çavekê mezintir li piruseya sîyasîya herêmê binêrin û danpêdanê bi xwebirêvebirina Kurdan biken. dencam da eve handereke bo civakê nîv dewletî ko danpêdanê bi serbxuya Kurdistanê biken weko dewlet eger



Kurdan ew pêngav havêt.

#### **4- hîlbijartin weko ezmûneke bo ehzaban:**

Ev hîlbijartine ezmûneke bo layenên sîyasîyên Îraqî bi giştî û yê Kurdistanî bi taybetî, çunkî dengderî padaşta hindek layenan deye û hindek layenên dîtir jî siza deyne. anko ew demê hawlatî bû binîyat bo desnîşankirina deshelatê û senga layenan bi rêka sinduqên dengdanê û bi rêka îradeyîya dengederan hate dîyarkirin, li wî demî dê layenên sîyasî jî hizir li pirugiram û xizmetguzarîyên baştir bo hawlatîyan ken. û dê li xwe zivirin. anko ev hîlbijartine pêngaveka dîtire bo pesendikirina pirugiramên paştir yê hizban û dencamda handereke bo pitir xizmetkirina hawlatîyan û dabînkirina xizmetguzarîyan bo hawlatî. bêguman her eve jî ye merem ji hîlbijartinan û hebûna demukirasîyê dinav sstemên sîyasî û îdarî da.

Bi kurtî dişeyn bêjîn evê hîlbijartinê werçerxanek êxiste di pirusêsa sîyasî li îraqê û herêma Kurdistanê da. û qazanca here serekî jî dê bo hawlatî zivirît. eger dengderî li ser binîyatekê saxlem dengê xwe dabît û dengdana wî bo pirugiramên hejî bît û xwe ji suzê û pîverên dîtirên heyî dûr



êxistbît. radê pêgehiştin û we'îya dengderî, nexşeyê sîyasî yê piştî ragehandina encamên hilbijartinan desnîşan diket. û li ser astê herêmê jî hindêk pêngav yê dihêne havîçtin ko navmalîya Kurdî rêk bikevît. dîsan berdewamî bi pilana serbxobûna abûrî ya herêmê dihête dan û ew pitirula Kurdan ewa li turkîya beref bazarên cîhanî hatîye rawanekirin. Ewe jî givaştineka dî ye herêm li ser Bexda diket dako li ber daxwazîyên Kurdan bihêt.